



## Piştî tundiya nijadperestane divê hûn çi bikin?

### Beratungsstellen für Betroffene rechtsextremer und rassistischer Gewalt in NRW

Birêzno,  
Malbatên hêja,

Hûn piştî derbaskirina seferên dirêj gihîştine Almanê. Teqez ev rêya jibo we hêsan nebûye. Û mixabin li vir jî her tişt hêsan nîne. Li Almanê dê gellek kes pêşwaziya we bikin. Lê hin kes jî henen ku nêrînên wan tund û nijadî ne. Êrîş û cihêkariyên ku pirranî li dijî koçberan e, hene.

Heke hûn, delal an hevalên we ji aliyê Nêo Naziyan (Neo-Nazis) ji ber egerên nijadperestiyê ketin ber êrîşê, hûn ê ji aliyê me alîkarî û piştgiriya werbigirin. Em bi awayê belaş, li ciyê we û heke hûn bixwazin bi awayê nenas, rawêjkariya bidin we. Em dema seredana polîs, berpîrs, doxtor û dadgehê, hevrêtiya we dikin. Em dikarin wergêrê/a devkî dabîn bikin, rawêjkariya hiqûqî raber bikin an jibo lêgerîna li parêzer/wekîl an rawêjkrê/a dermanî alîkariya we bikin.

Me li vir zanyariyên kurt û girîng jibo we berhev kiriye. Ji kerema xwe van zanyariyan li ber destê kesên din jî daynin!

Hûn dikarin bi riya têlêfon an E-Mail`ê digel peywendiyê bigirin – Ji kerema xwe jibo peywendiya digel me kêmasiyê nekin. Piştî peywendiyê, em dikarin bi hev ra hilkolînin kanê çi cûre kiryar dikarin jibo rûbirûbûna digel rewşeke dijwar alîkariya me bikin. Em li kêleka we ne û piştî we digirin – nabe ku kesek bi tenê bimîne.

Koma rawêjkariyên Qurbanîyan li NRW`yê

#### Tiştê ku hûn gere piştî êrîşêke nijadî bizanin

Hûn wekî qurbanîyê tundiya, xwedana mafên wekî welatîyên almanî ne. Heke we xwest ku hin sûcan ji polîs ra ragihînin, divê netirsîn; Ji ber ku vî karî tu bandora xwe ya nerênî li ser pêvajoya penabertiya we tune. Heke hûn bi giranî li ber derxistinê ne, hûn dikarin daxwaza demeke taybet bikin da ku derxistina we bikeve derengiyê. Renge pêwîst be ku wek şehed li dadgehê li dijî êrîşker û sûcdaran şehediyê bidî.

Hûn neçar nînin ku bersiva polîs bidin – Hûn jibo biryardana jibo vegotina guwahî ş şehediyên, azad in! He-tawek mînak heke polîs piştî êrîşê rasterast were nexweşxaneyê û ji we bixwaze ku hevrê digel wan herin, hûn dikarin vî karî nekin. Elbete ev yek jibo dozgerê gelemperî an dadgehê cihê ye: Heke hûn dixwazin tiştê ragihînin divê ku herin dadgeh an nivîsgeha dozgerê gelemperî.





# Infopaket Flucht und Asyl

Ev mafê we heye ku dema lêpîrsîna polîs, kesek hevrê digel we be. `Kesê/a ku pêbaweriya we bi wî/ê heye` dikare dema seredana polîs, nivîsgeha dozgerê gelemperî an dadgehê hevrê digel we bê. Polîs gere dilniya be ku wergerê/a devkî heye û tu pîrsgerêkek li warê têgihîştinê tune. Ev mafekî gellek girîng e! Hûn dikarin û divê ku li ser vê yekê pêgiriya bikin. Bi vê riyê her tiştê ku we bihîstiye an dîtîye dikare bi deqîqtirîn awayê pecan were nivîsîn û tomarkin. Em kêfxweş dibin ku li bara her pîrsa ku li bara tawanên cezayî hene, rawêjkariyê raberî we bikin. Heke hûn bixwazin em li dema lêpîrsîna polîs jî hevrêtiya we dikin.

Piştî êrîşa fîzîkî, gere ku hûn berê xwe bidin doxtor. Li wir gişt ziyar û derbe tîne tomarkin. Hûn dikarin û gere ku amaje bi hemî ziyarên ku we dîtîne, bikin. Ev 'Piştrastnameya Pîzişkî' gellek girîng e! Nexweşxane erkdar in ku li rewşê awarte û orjansî we derman bikin! Ev mijar heta heke hîn we ji nivîsgeha dabînkariya Civakî piştrastnameya Bîmeya (sîgûrteya) dermanî wernegirtibe jî gere pêk were. Her kes ku ji ber êrîşên nijadî tûşî ziyarê bibe, mafê wî/ê heye ku diravê ziyarê/xerametê werbigire. Jibo werhirtina diravê ziyarê/xerametê pêwîst nake ku sebebkarên êrîşê bê naskirin.

Heke ciyêmayîn an avahiya we bikeve ber êrîşê, heta dema gihîştina polîs, xwe ji destlêdan an cîbicîrkirina her tiştê ku têkidarî êrîşê ye, dûr bikin. (Wek mînak Kevir, Botrî, Morik û hwd). Tevî viya baştir ev e ku bi tîlêfona xwe çend wêneyan ji bûyerê û dûhatên wê bigirin.

Heke hûn birîndar bûne, mafê we heye ku digel wekîl/parêzer jibo pêkanîna dosyeya cezayî li dijî sûcdaran rawêjkariyê bikin. Ev kar gellek serpişkiyên wî hene. Hin şêwaz jibo werhirtina alîkariyê li babeta xercan heye. Em dikarin bersiva pîrsên we bidin û bi hev ra rêkarekê peyda bikin.

Quelle: <http://www.agg-ratgeber.de/checkliste.php> + <http://www.agg-ratgeber.de/unterstuetzung-durch-beratungsstellen.php>

---

Li North Rhine Westphalia`yê du navendên zanyariyan jibo kesên ku ji ebr tundiya rastgir a zêdegav an nijadî ziyar dîtîne, hene: Bek Ap (Back Up) li Dortmundê berpirsa navçeya Westphalia-Lippe`yê ye (navçeya Arênsbêrg, Dêtmold û Monstêr). Opferberatung Rheinland li Dosêldurof jib o serlêdana kesên ziyandîtî ye ku li navçeyên Dosêldurof û Kolnê ne.

## Navendên zanyariyan jibo kesên ziyandîtî ji tundiya rastgirên zêdegav an nijadperest

### Back Up - Beratung für Opfer rechtsextremer und rassistischer Gewalt

Königswall 36  
44137 Dortmund  
Tel: 0231 53200941  
Fax: 0231 53200944  
[backup-nrw.org](http://backup-nrw.org)

### Opferberatung Rheinland(OBR) – Beratung und Unterstützung für Betroffene rechtsextremer und rassistischer Gewalt c/o IDA-NRW

Volmerswertherstraße 20  
40221 Düsseldorf  
Tel: 0211 159255 66  
Fax: 0211 159255 69  
[www.opferberatung-rheinland.de](http://www.opferberatung-rheinland.de)